# Hişmendiya ku koma cîhana hest û ramanan e

Wergera ji zimanê Tirkî: Aram ALÎ

Yilmaz BARAN

Em di pêvajoyeke wiha de ne ku qeyran, bi pey hev re tên jiyîn. Ev heyam, aşkere ye ku heyama QEYRAN'ê ye. Û niçikên(seriyên) vê navbenda QEYRAN'ê vekirî ne. Hêzên serwer, armanc dikin ku hemû danehevên xwe, hemû derfetên xwe û hemû armancên xwe bikin yek û ji navbenda QEYRAN'ê xwe rizgar bikin. Bi dûv wê yekê ne ku di çarçoveya "Pergala Nû ya Cîhanê" ya ku jê re dibêjin PNC de, li hemberî gelan, herêman û avaniyên cuda, bi destwerdanên aşkere û yên veşartî re, pergala ku ew dixwazin ava bikin. Ji bo vê jî nerazîbûnên li hemberî pergala heyî vediguherînin fersendê, li hin cihan şerên navxweyî û derveyî derdixînin û rêbaza şerên spartedariyê(wekaletê) bi kar tînin. Avaniyên qaşo "tundraw", "demkratîk" û "azadîxwaz" ava dikin, lê armancên wan ên sereke ew in ku bigihêjin armancên xwe. Ji her tiştî



bêtir jî demokrasî û azadîxwaziyê derdixin pêş û tînin ser ziman. Li gorî vê bergehê, gotinên civakî û mirovî yên weke “vegotina cudahiyên civakî (nasname, ol, mezheb û hwd.), mafên mirovan, pêşketina teknolojiyê û bilindirina asta jiyanê û zêdekirina hilberîna aboriyê” tînin ser ziman an jî bi alîkariya amûrên pêşverû yên ku tevgerînekê ava dikin ên weke pêşketin û veguhertinê, di serî de saziyên çap, belavkarî û ragihandinê, hemû avanî û kesên ku bi wan ve girêdayîne dixin tevgerê.

Tiştên ku em dixwazin behsa wan bikin, ji derveyî rastiyên seraser ên ku tên dîtin, tên zanîn û tên vegotin in; em dixwazin behsa realîteyên derveyî vana bikin. Di destpêka van rastiyan de jî diyardeya hişmendiyê tê ku rê dide bîrdoziyê, siyasetê û jiyanê. Avabûna hişmendiyê, bi civakîbûnê re derketiye holê û di demeke dirêj de ava bûye. Ev avabûn û pêkhatina hişmendiyê ya ku li derveyî tiştên heyî pêş ket, ne diyardeyek e ku bi hêsanî veguheriye rastiyê. Ji bo nepejirandina teqez a hişmendiya kevn, divê xwestekeke zelal, vîneke xurt û hêzeke biryarê ya biisrar hebe. Heger wiha nebe, wê hişmendî, parçebûyî be; wê raman, şêlû be; wê ziman, tevlihev be û jiyan jî wê jihevdeketî be. Di encamê de di bingeha pevçûn û têkoşînên heyî de hişmendî heye û bîrdozî û siyaset jî, şerê hişmendiyê yê spartedar dimeşînin. Zanîn û fêmkirina vê hişmendiyê, tê wateya naskirina bûyeran, fêmkirina QEYRAN’a ku li seranserî cîhanê heye, dîtina herikîna jiyanê û gihaştina hêza veguherînê ya optîmal.

Wê çaxê diyardeya hişmendiyê çi ye? Çawa teşe digire? Li gorî çi pîvanan werdigire? Çi ne ew

tiştên ku pîvana veguhertinê diyar dikin? Awayê geşedanê, hêman û rêzikên wê, li ser kîjan bingehê dikevin meriyetê? Gelo di nava guhertinê de rîsk hene? Dema ku bergeha xwe diyar dike di nava xwe de kîjan hêmanan vedihewîne; ji kîjan diyardeyên ramanî û jiyanî bi bandor dibe? Şert û mercên ku tê de ye li gorî çi xwe didin der û li gorî çi cewher û teşeyê wê diyar dibe? Çiyê civakê vedibêje? Di têkiliya cewher û teşeyê ya civakê de li ku disekine? Xwedî kîjan erk û ristê ye? Civakê çawa beralî dike? Têkiliyên wê yên bi dîroka civakî re çawa ne? Li ku derê civakê û bi çi awayî cih digire? Têkiliyên wê bi çandê re hene? Heger hebin, di kîjan astê de ne? Têkiliyên wê bi aboriyê re hene? Şêwazên wê yên bandorê û bandorîbûnê çawa ne?... Mirov dikare pirsên wiha zêdetir bike. Lê girîng e ku mirov, piştî ku ji ceribandinên civaka dîrokî derbas dibin, li herka jiyana nû ya avabûn û geşedanan binêre. Her wiha mirov dikare bi alternatîfbûna hişmendiya ku hatiye veguherîn, lêkolîna rastiya wê bike, venêrîna wê bike, bigihêje çespandinan û wan tomar bike yan jî red bike.

## Hişmendî Çi Ye?

Heger pênasîn bi awayekî rast û di cihê xwe de werin kirin; asta têkiliyan û çalakiyên têgeh, dozîne û avaniyan jî wê bêtir bi naverok bin. Lewra ***"hişmendî, sinc û estetîka ku civakekê bi dest xistiye, daneheva civakî ya hest û ramanê ye; hebûna nasnameyê û ya kêliyê ya wate û hestan e ku derketiye asta bîreweriyê û hatiye vegotin."***(1) Wê çaxê guhertina paradîgmayê ya herî xurt, ya ku bi şoreşa hişmendiyê re pêk tê ye. Bi taybetî jî pêkanîna guhertin û veguhertinê ya şoreşger a bi şêwazê Ronesansê, rêbaza herî erênî ye. Ev rê, riya herî hevgirtî, radîkal û mayinde ye. Her wiha di çarçoveya rastiyê de, ji felsefeyê re qadeke berfireh, kûr û tîr vedike. Dike ku lêpirsîn, bersiv û şîrove bi awayekî herî tendurist û nêzîkî rastiyê pêk werin.


Peyva ***"zihniyet"***ê (hişmendî), gotineke Erebî ye û tê wateya koma cîhana raman û hestên civakê û kesan. Tevî tevgerên mirovan, koma xebatan û pêvajoya giyanî ya ku mirov tê de ye ye. Hêza têgihiştin û fêmkirina gerdûnê, xwezayê, civakan û xwe bi xwe ya civak û kesan e. Çalakiyên mirov ên ramanî, giyanî û jiyanî ye ku ji bîrdoziyê heta ekolojiyê, ji mîtolojiyê heta olê, ji felsefeyê heta zanistê, ji têgihiştinê heta baweriyê, ji sincê heta wicdanê, ji çanda teng heta huner û wêjeyê û ji wir jî heta aborî û polîtîkayê, manewiyat û wateyê bîra mirovan e ku xwe dispêre zanistan û him îro ye him doh e him jî bergeha çalakiyên mirov e. Bîra hin xebat, danehev û afirîneriyên ku ji pêşerojê heta îro tên

e. Têgihiştin, bawerî û hêviya civak û kesan e. Tiştê ku kesayeta mirovan ava dike û rê nîşanî wê dike, avaniya hişmendiyê ye. Vegotina pratîk û zimanê mirov, mirêka pîvanên hişmendiyê ya mirov e. Dîroka civakan, di heman demê de dîroka hişmendiyê ye; vegotina têkoşînên di navbera serdest û bindestan, mêtînger û mêtîngehan, desthilatdar û bindestan de ye û di heman demê de vegotina têkoşînên çînî û zanistî yên di bin navê têkoşînên ol, mezheb û terîqetan e. Civak, pergala heyî nepejirandine û dijberî û nepejirandina xwe bi rêxistin kirine û jiyaneke alternatîf danîne holê.
Li gorî hin destnîşankirinan hişmendî, bi têgehên weke mantalîte, hiş, raman, mantiq û bîrûbaweriyê re tê heman wateyê yan jî nêzwateyê ku bi pîrozbûna danehevan û civakîbûna kedê re û bi nirxên cîhana giyanî re ava bûne. Bi taybetî jî xebatên ronakbîriyê yên ku xwe dispêrin zanebûnê û cîhana giyanî ya mirovan, hişmendiya kesan ava dikin. Hest û pêşbîniyên weke bîrûbawerî, bawerî, îman, hêvî, manewiyat, moral, girêdan, hezkirin, rêzgirtin, nefret, tirs, wêrekî, kêfxweşî, xemgînî, hêrs û hwd. ên ku di mirovan de hene, ji bingeh, xweza û xebitîna aqilê mirov ne qut in. Bi taybetî jî yekbûna mejî û dil, bi şêwazê jiyanê re dibe yek jî hêmanên sereke. Weke kodikên hevgirtî yên zanista fizîkê ne. Her agahî û zanebûnên ku dikevin nava mejiyê mirovan him cîhana hestan bi teşe dikin him jî şêwaza jiyanê beralî dikin. Carinan berovajî vê yekê jî derbasdar e. Mirov nikare jiyanê ji cîhana giyanî û cîhana ramanî qut bigire dest û wiha binirxîne. Rê û rêbaza herî xerab ev e. Jê xerabtir tune ye.

## Hêmaya hişmendiyê û veguherîna wê

Hêmaya hişmendiyê, di teşegirtina hemû avabûn û avanîbûnên civakî û mirovî de hêmaya sereke ye. Mirov dikare jê re bêje “hêmaya çavkani”yê. Hişmendî, riya sereke ya avaniyên weke sinc, mîtolojî, ol, huner, wêje û felsefeyê û bîrdoziya ku bi yekbûna van hêmayan re teşe digire ye; çavkaniya sereke ya van hêma û avabûnên ku behsa wan tê kirin e; di naverok û teşeyên şêwazên bîrdoziyê de diyarker e. Ev hemû, di nava xwe de bi awayekî çalak bandorê li hev dikin. Têkiliya di navbera wan de sîmbîyotîk (herdu alî jî sûdê jê werdigirin) e. Lê hişmendiya zilam, di nava van 5-6 hezar salan de bi fen, bêbextî û derewan nirxên civakî û mirovahiyê berovajî kirine û navê wê jî kiriye ***“şaristanî”***. Hişmendiya zilam, di destpêkê de pêkhateyên hişmendiyê, di warê madî û manewî de hemû tiştên civakê dizîne, bi zorê ji wan standine û li ser van nirxan desthilatdariya xwe ya bêserî û bêdawî ragihandiye. Di her demê de hêza navendî ya

hişmendiya zilam were guhertin jî, bi bikaranîna amûrên zorê, xwe gihandiye asta hêza hegemonîk.
Hişmendî, vegotina bîrûbawerî û baweriya civakê ye. Bîrûbawerî, ne tenê vegotina agahiyan e; her wiha bi qasî zanebûna xwe pêkanîn e jî. Lewra zanebûn, riya pêkanîna tiştan jî diyar dike. Bawerî jî, baweriya ji tiştên ku tê zanîn e û pêkanîna egerên wê ye. Vîn, hêz û biryardarî jî li ser vê bingehê dikevin meriyetê. Li vir gotina Rêber APO ya ku dibêje "zanebûn, pêkanîn e" dikeve meriyetê.
Hişmendî, bi hêsanî ava nabin û bi hêsanî nayên guhertin. Berovajî bîrdozî û polîtîkayê, guhertin û veguhertina hişmendiyê, di demeke dirêj de pêk tê. Divê were pejirandin, dahundirandin û bibe jiyan bixwe, ango divê bibe weke hêmayên çandî. Incex wê çaxê pîvanên jiyanê û rêzikên xebatê bi wate dibin. Wê çaxê avaniya hişmendiyê, dikare ji cîhana me ya ramanî berê xwe bide sekna me ya bîrdoziyê û helwesta me ya polîtîk. Çalakiyên me yên jiyanî jî di vê bergehê de dikarin pêş bikevin. Bersiva civakî ya guhertin û veguhertina hişmendiyê û herikîna jiyanê, dikin ku ev şêwaz bimeşe. Tevgera jiyanê bi cîhana ramanî, bi cîhana hestan re, bi wateyên nû yên ku li têgeh, dozîneû saziyan bar dibin riya xwe dibîne û di heman demê de veguhertina hişmendiyê pêk tê û xwe ava dike. Ji bo vê veguhertinê gelek hewldan, ked, biryar, israr û vîn pêwîst e. Dema ku mirov di riya armanc û hedefan de bi biryardarî dimeşe û digihêje serkeftinê, êdî deryaya kêfxweşiyê li ber lingên mirov e. Bes, divê em zanibin gavan biavêjin û bê tirs û xof tevbigerin.
Veguhertina hişmendiyê, tê wateya veguhertineke krîtîk û xeternak. Di heman demê de li gorî doza "dema civakî" ya ku Bradûel ji bo dîrokê bi kar tîne jî di nava ***"dema-dirêj"***



de ye. Ev beşa ***dema-dirêj*** di nava herikîneke hêdî û kûr (beriya dema desthilatdariyan jî) de pêş dikeve û geş dibe. Carinan jî dixitime û di nava şablonan de difetise. Guhertineke wiha çi di warê erênî û çi di warê neyînî de be jî bergeh û tevgerên mirovan û civakê diguherîne û bi nêrîneke cîhanê ya nû re şêwaza wan a jiyanê nû dike. Bi vî awayî di çarçoveya ***dema-dîrokî*** de serdema nêrîn û tevgeran jî dest pê dike.
Di dema geşedana veguherîna hişmendiyê de di nava têgeh, dozîne û saziyên ku di civakîbûnê de cihê wan heye de têkiliyeke diyalektîk pêşdikeve. Ev xalên li jêr jî mohra



xwe li vê rêbazê dixin:
**a)** Şêwaza diyalektîka sîmbiyotîk e
**b)** Gihaştina hevsengiya optîmal e
**c)** Gihaştina pêşeroj û paşerojê ya di roja me ***(kêlî)*** de ye
**d)** Pergala wê, li gorî hebûna wê hevgirtî ye
**e)** Gihaştina hevsengiya rêjeyê ye
**f)** Girêdana di nava wan de cewherî ye
**g)** Têkiliya di navbera wan de berdewam e û herikbar e

Di roja me de ***serdema sermayedariya fînansê*** heye ku nûnertiya merhaleya dawî ya hişmendiya sermayedariyê dike ku bi armanca ku hişmendiya zilam di rewşa heyî de rewşa xwe ya hegemonîk gelemperî bike serî li fen, bêbextî û şaşitiyan dide. Ev merhaleya dawî, di mîtolojiyan de di ol û pirtûkên pîroz de weke dawiya cîhanê, dema hesabdayînê û roja mehşerê derbas dibe. Sermayedarî, bi serdema sermayedariya fînansê xwe weke pergaleke bêdawî nîşan dide, lê di rastiyê de li ser asta cîhanê têkçûna xwe ragihandiye. Ev ragihandin jî, destnîşankirina rojaqiyametê ye. Tiştê ku dawî lê hatiye, sermayedarî ye û hişmendiya zilam e ku çavkaniya wê ye. Her çiqasî dibêje ku wê xwe nû kiriye, veguherandiye û guhertiye jî di bingeha xwe de xwe dispêre çîrokên çêkirî û dixwaze temenê xwe hinekî din jî dirêj bike. Jixwe rista wê ya sereke ew e ku pirsgirêkên civakî berfirehtir û kûrtir bike. Hebûna wê bixwe pirsgirêk e. Sermayedarî, çavkanî û sedema alozî, pevçûn û şerên heyî ye. Pergala wê li dijî civakê ye. Rehên wê digihêje avabûna dewletê ya ku teşegirtina pêşîn a desthilatdarî û sermayeyê ye. Ev avanî, bingehên pirsgirêkê ne. Ev 5 hezar sal in ku di çarçoveya dijminahiyê de teşe girtine. Dijminahiya li dijî jinê, bingeha vê avaniyê ye. Paşê jî dijberiya civak, sinc, demokrasî, azadî, ekolojî û aboriyê jî berdewam kirin. Avabûna wê, li ser bingeha dijberiyan

e. Dijminahiya şoreşa neolîtîkê ya ku afirîneriya çanda jina dayîk e kiriye û weke şoreşeke dijber pêş ketiye. Hişmendiya wê, taybetmendiyên wê û avaniya wê li gorî vê dijberiyê ava bûne.

Di vê dema ku em tê de derbas dibin de avaniyên hişmendiyê yên civaka jêrîn û civaka jorîn di nava şerê dawîn de ne ku ev şer 5-6 hezar sal in ku berdewam dike. Ev têkoşîn û pevçûn, heta roja me ya îro bi şêwaz û avayên cuda berdewam kiriye. Carinan bi şerên çîn, ol û nasnameya gelêrî hatiye meşandin û carinan jî bi navê mezheb, terîqet, cemaat û partiyan têkoşîn hatine meşandin. Her wiha têkoşînên bîrdoziyê, yên felsefî, zanistî, çandî û polîtîk jî hatine berdewamkirin. Tevgera şoreş, berxwedan û serhildanê qet nesekiniye; lêgerînên demokrasî, azadî û dadweriyê hertim çêbûne. Ev hesabpirsîn, li dijî hêzên desthilatdarî û mêtîngeriyê, di destpêkê de jin, ji hêla hemû bindest û kesên ku rastî çewisandin, zulum û bêbextiyê tên ve tê meşandin. Ev têkoşîn, li dijî hişmendiya zilam, hêzên desthilatdar û sermayedar û li dijî dewleta ku hêza parastvanê wan e tê meşandin. Di vir de divê em bi taybetî destnîşan bikin ku li ser gelan dixwazin pêkutiyeke bîrdoziyê, pêkutiyeke felsefî û polîtîk ava bikin. Ango dixwazin hegemonyaya xwe ava bikin. Û hegemonyaya herî xeter, hegemonyaya hişmendiyê ye. Hegemonyaya hişmendiyê, hegemonyaya qirkirinê ye ku bi hemû awayî tê meşandin. Rêbaza sereke ya domdarîkirina hegemonyaya hişmendiyê jî, meşandina qirkirinên fizîkî û çandî ya bi hev re û di nava hev de ye. Heger civak û mirvahî ji cewhera xwe dûr bikevin û bibin girseyên takekes, wê çaxê wê ev rêbaz bi ser bikeve.

Ev pêvajoya ***qeyranê(kaos)*** ya ku tê jiyîn, bi awayekî aşkere dide xuyakirin ku êdî çîrokên çêkirî yên derew ên hêzên desthilatdar û mêtînger weke berê bandorê nakin û êdî edi vê demê de bêhna xwe ya dawî didin. Di vê demê de rûpoşên civaka jorîn, li hemberî civaka jêrîn ketine erdê; pîvanên dadweriyê êdî nemane; derew, fen, dizî û talan zêde bûne û êdî deshilatdar nikarin serdestiya xwe ava bikin. Em ji demeke wiha derbas dibin ku êdî nikarin bi çîrokên çêkirî civakan weke bêaqil û ehmeq bibînin û êdî sextekariyên wan bingehekê ji xwe re nikarin ava bikin. Qeyran bi dûv hev de tên û bêçarebûna hêzên desthilatdar û mêtînger dike ku bêtir har bibin. Zengilên neyînî ji bo modernîteya sermayedar lê didin û hêzên hegemonîk, netewe dewletên ku bi wan ve girêdayî, hêzên wan ên paramîlîter û avaniyên wan ên çete,li hemberî civakan di nava êrîşên hov de ne.

Ji bo ku ji vê ***dema qeyranê*** derbikevin avaniyên hegemonîk, dewletên neteweperest û faşîst û hêzên demokratîk û azadîxwaz di

nava şer û têkoşîneke polîtîk de ne. Hişmendiya dewletên neteweperest û faşîst jî, modernîteya srmayedar e. Di warê hişmendiyê de du hêz têdikoşin, lê di warê polîtîk de şerê sê siyasetan heye. Ev têkoşîn, di warê gerdûnî de têkoşîna di navbera civaka jêrîn û civaka jorîn de ye. Hêzên hegemonîk ên civaka jorîn, dixwazin dawî li netewe dewletê bînin û di vî şerê ku dixwazin cîhanê ji nûve "sererast" bikin de hêzên cuda bikar tînin. Di rastiya xwe de sermayeya gerdûnî, ji sedî yekê (%1) cîhanê ye û têkoşîn, li hemberî vê ye. Lê ev rêjeya biçûk, carinan bi awayekî fîzîkî xwe bi hêza madiyat û derewan û bi xofa amûrên zorê û tirsê digihêjîne ji sedî deh, bîst û sihî û heta bêtir jî. Ji ber ku avaniyên teknîk, zanist û hemû endustriyalîzmê di destê wan de ye.

Ji salên 1980'î û heta niha hêzên desthilatdar û mêtînger ji bo ku berdewamiya xwe pêk bînin û berjewendiyên xwe biparêzin, dixwazin PNC (Pergala Nû ya Cîhanê)'yê ava bikin. Hêzên dewleta neteweperest jî ligel zengilên mirina xwe dixwazin hebûna xwe berdewam bikin, mêtîngeriya bidomînin, xwe weke bêdawî ragihînin û xwe neguherînin. Avaniyên Demokratîk û Azadîxwaz ên ku li ser asta cîhanê deng û hêviya bindestan in jî dibêjin ku ***di çarçoveya modela a-dewletê de rastiyeke civakî ye ku cîhaneke wekhev û komunal dikare were avakirin ku cudahiyên demokratîk tê de hene, di çarçoveya sincê de pîvanên dadweriyê lê hene***. Li gorî vê jî refên xwe yên di nava têkoşînê de her roj berfirehtir û kûrtir dikin û pêngava meşandina vê têkoşîna ya bi pergal pêş xistine. Gavên demokrasî û azadiyê tên avêtin û qêrînên daxwaza sinc û ddadweriyê li her derê belav dibin. Sepanên pratîkî yên jiyana wekhev, komunal û kolektîf deng vedidin. Yekitiyên bîrdoziyê û polîtîk û yekitiyên stratejîk û taktîk avadibin; bi zanebûna ku divê serdema nû ava bibe re qad û ref tijî dibin. Ji bo avakirina Konfederalîzma Demokratîk, di çarçoveya hişmendiyê de hevbeşiya hêviyê, yekitiya hêzê û yekbûna kedê de têkoşîna ku tê dayîn xurt dibe. Ev xurtbûn, xofê dixe dilê hêzên desthilatdar û sermayeyê yên ku ev 5 hezar sal in li dora navenda hişmendiya zilam kom bûne; dike ku xewnên nebaş bibîne.

## Têkiliya Hişmendî û Civakîbûnê


Ji dîrokê heta roja me ya îro hişmendî him bandorê li mîtolojî, ol, felsefe, zanist, sinc, huner, ekolojî, wêje, wate û kevneşopiyan dike him jî ji wan bi bandor dibe. Rêjeya wê ya li ser van têgehan diyar û diyarker e. Ji lewra ye ku avabûna hişmendiyê bi van têgehan re di nava hevdu de û di çarçoveya yekitiya hestan de pêş ketiye. Tiştê ku jiyanê beralî dike, teşeyê dide jiyanê û wê bi wate

dike, ev avaniya hişmendiyê ye. Em nikarin hişmendiyê, ji civakê cuda bikin û nikarin civakê jî ji avaniya hişmendiyê qut bikin. Tiştê ku civaka pêşîn ava kiriye, bi awayekî prîmatîf be jî hişmendî ye. Pêkhateyên teng ên çandê jî hişmendiyê bi teşe dikin. Ew jî rastiyên civakîbûnê ne. Cîhana raman û giyanê, rastiyeke civakî û mirovî ye; yek ji hêmanên giştî ye. Heger ev nebûya me yê nikarîbû behsa civakê û mirovbûna wê bikira. Beriya vê merhaleyê jî jiyana kerîbûnê hebû ku hêj civakîbûn pêk nehatibû.

Di dirêjahiya dîroka civakan de, di dem û mercên cuda de avaniyên hişmendiyê yên cuda pêk hatine. Di pêvajoyên Paleolîtîk û Mezolîtîkê -ku weke serdemên civaka xwezayî tên pênasekirin- de pîvanên jiyanê yên koçeriyê, li gorî hin rêgez û rêzikan dihatin meşandin. Ev rêgez û rêzik, bandor li cîhana ramanî û hestî dikir û hişmendiya wê demê wiha ava dibû. Di wê demê de hişmendiyeke ku bi baweriya anîmîzmê (giyanperestî, zindîperestî) bi teşe dibû û cîhana hestanû şêwaza jiyanê ya li gorî vê yekê dihate jiyîn. Tê de yekbûyîn sereke bû. Her hêman, yek ji endamên giştî bûn. Xwezaya civakî hebûna xwe didomand û yekbûnek hebû. Di nava gerdûn û xwezayê de, di nava xweza û civakê de û di nava civak û kesan de cudahiyeke çêkirî û nakokî tune bûn. Rewşa kirde û bireseriyê, di nava yekbûyînekê de bû. Jiyaneke ekolojîk serdest bû ku her hebûnên di xwezayê de weke xwe zindî didîtin. Jiyana klanan(komikên mirovan) a wekhev, azad, demokratîk û dadwer, bi pîvanên sincî û polîtîk berdewam dikir. Hişmendiya civakê jî li gorî vê şêwaza raman, hest û jiyanê teşe girtibû û di heman demê de ew beralî dikirin. Rêzikên komunal û kolektîf sereke bûn û jiyan, di nava yekbûyînekê de û bi xwezayê re di nava hevsengiyê de berdewam dikir. Mirov xwe weke parçeyeke ji xwezayê didît û ev jî aramî û ewlehiyê didayê. Li ser civakan û ekolojiyê, aştiyek serdest bû. Pêdiviyên jiyanê li gorî pêdiviyan ji xwezayê dihatin komkirin. Ezezitî, takekesî û komkirina danehevan tune bû. Bîrûbaweriya klanê, hişmendiya pêkhateyan bû. Cîhana ramanî û giyanî ya mirovan, li gorî klanê û hebûna wê teşe girtibû. Klan, di nava xwezayê de hebûna xwe berdewam dikir û xweza jî bi rastiya klanê bi wate dibû. Zanebûn, danehev û hişmendiya klanê, xweza pênase dikir. Bi vî awayî avaniya pêşîn a sosyalojiya civakan ava dibû. Di klanê de malbata fireh hebû. Di çarçoveya otorîteya demokratîk de jiyaneke azad, li dora çanda jina dayîk ava dibû. Nêrîna li cîhanê ya klanê bi hêmanên gerdûn, xweza, civak û kesan re yekbûyî ye. Têgehên weke parçebûn, belavbûn, dijberî û dijminahiyê di bîrûbaweriya klanê de û ji lewra jî di hişmendiya klanê de cih nedigirt. Ji bo klanê têgehên

wiha û xebitîna wan, biyanî bû. Ji ber ku cudahiya kirde û birserê tune bû û hişmendiya zilam hêj ava nebûbû, dabeşkirinên weke jin û mêr, gerdûn û xweza û civak û kesan û cudahiyên çînî jî hêj ava nebûbûn. Herkes û hertişt ji bo klanê bûn. Heger tiştek ji bo klanê rast û sûdwer be, wê ji bo kesên ku di nava vê avaniyê de cih digirin jî erênî, guncaw û sûdwer be. Heger zirar bigihêje klanê, zirar digihêje hemû pêkhateyên wê. Heger tiştek ji bo klanê nebaş be, ji bo hêmanên klanê jî nebaş û neyînî ye. Êrîşeke li dijî klanê, dihat wateya êrîş û destavêtina li dijî endamên wê jî. Bi kurtasî her diyarde û bûyerên rast û şaş, baş û xerab û xweşik û kirêt ên ji bo klanê, ji bo endamên klanê jî dihatin heman wateyê. Hişmendiya klanê serdest bû. Mirov, li gorî klanê difikirîn û hestên mirovan jî li gorî hebûna klanêava dibûn. Xebatên pratîkî jî li gorî berdewamkirina jiyana klanê teşe digirt. Ji ber ku berdewamkirina jiyana klanê, dihat wateya berdewamkirina jiyana endaman. Tunebûna wê jî dihat wateya tunebûna wan. Her qad û kêliyên jiyanê, li gorî klanê teşe digirt. Windakirina klanê, dihat wateya windakirina hişmendiyê. Jiyaneke bêyî wê çê nedibû. Bi vegotineke rojane hişmendiya “yek kes ji bo me hemûyan û em hemû jî ji bo yek kesî” him hişmendiya klanê bû him jî hişmendiya kesan bû. Tevahiya klanê, yek kesî rave dikir û hebûna yek kesî jî rasterast bi giştî ve girêdayî bû. Hebûna klanê, dihat wateya hebûnapêkhateyan. Dema digotin “hertişt ji bo klanê ye” ev dihat wateya “hertişt ji bo kes e” jî. Hişmendiya klanê li gorî kodên çanda teng teşe digire. Bi vegotineke din, hişmendiya çanda teng, nêrîna li cîhanê ya klanê û cîhana wê ya giyanî diyar dike. Şêwaza xwe ya jiyanê jî li gorî vê yekê berdewam dikir. Sinc û polîtîkaya ku di wateyên teng û fireh de pêkhateyên çandê ne, şêwaza jiyanê ya klanê bûn. Û jiyan di nava hezkirin û kêfxweşiyê de diherikî. Weke ku di nava deryaya kêfxweşiyê de bûn.

Piştî jiyana klanê (piştî serdemên paleolîtîk û mezolîtîkê), bi saya şert û mercan û bandora erdnîgariyê û di binê rastiya siriştî de çand gelekî pêş ket. Di çarçoveya cudahiyan de cîhana ramanî gihaşt lûtkeya xwe. Hişmendî kete pêvajoya veguhertinê. Bergeh û şêwaza baweriyê guherî. Bi taybetî jî di qadên hilberîn, avanîsazî û teknîkê de şoreş pêk hatin. Civak ji klanê derbasî eşîrbûnê, ji anîmîzmê derbasî totemperestiyê, ji nêçîrvanî û komkirinê derbasî çanda çandinî û gundîtiyê û xwedîkirina sewalan bû. Guhertineke şoreşî pêk dihat. Êdî tu tişt ne weke yên berê bûn. Divê mirov van serdeman, ango serdemên civaka xwezayî, baş fêm bike, taybetmendî û xebitîna wan baş binirxîne û girêdana wan a bi dema me ya îro re xurt ava




bike. Lewra, ***“Cîhana hişmendiyê ya civaka xwezayî, xwe dispêre têgihiştineke xwezaya zindî. Tê hesibandin ku giyanê her diyardeyên xwezayê heye. Giyan, weke taybetmendiyeke ku zindîbûnê pêk tîne tê hesibandin. Di têgihiştinên olî yên totemîk de hêj têgihiştina xwedayekî ku ji wan cuda ye, serdest e û ji derve ye pêş neketibû. Civaka xwezayî di hevlêkirina bi giyanên xwezayê ango bi hêzên xwezayê re de gelekî baldar bû. Nelihevkirina bi van hêzan re dihat wateya mirînê. Heger nêrîna sereke ya li ser xwezayê wiha be, pêdiviya hevsengiyeke xurt derdikeve holê.”***[2] Û her diyardeyeke ku berê hebû, di nava yên ku nû ava dibin de cih digire, heta bi yên nû re pêş dikeve û hevdu pêş dixin û xwe ava dike. Bi vî awayî serdema ***Çand û Teknîka Gund û Çandiniyê*** dest pê dike. Li gorî mercên nû dihilberînêde serdemên bi xêr û ber têne jiyîn. Gelhe (nifûs) zêde dibe. Berhem zêde dibin û hebûna zêde ya qût û beran dibe ewlehiya jiyanê. Zanebûn û pîvanên jiyanê yên kevn di nava tiştên nû de cihê xwe digirin û ji nû ve, lê di çarçoveya cudahiyan de teşe digirin. Ev hişmendî, hişmendiyek e ku bi ser dikeve û jiyanê ji nû ve ava dike. Bi bergeheke nû gerdûn, xweza û civak ji nû ve tên sererastkirin. Teşegirtina zekaya analîtîk û ya hestî ya ku di vê çarçoveyê de ji nû ve teşe digire û cewhereke nû li xwe bar dike, di riya armanca pêkhatinê de bi lezûbez dimeşe. Nûvedan(îcad), vebîn(keşîf), afrînerî û dahênerî bi dûv hev de tên û huner û wêje jî çarçoveya mîtolojiyan rave dikin. Bilindbûna asta jiyanê, zêdebûna gelheyê, têkiliyên cîraniyê û danûstandinên bi herêmên dûr re dikin ku dewlemendiya çandî zêde bibe; ev geşedan di warê çandî de kûrahî û berfirehiyê ava dikin. Ev jî di heman demê de tê wateya mezinbûna hişmendiyê û berfirehbûna qada bandorê. Di rastînhevê vê yekê de jî bilindkirin û pîrozkirina civakê heye. Tiştên ku tên pîrozkirin, afirîneriyên şoreşa neolîtîkê ne. Lê tiştê ku vê pêvajoyê û afirîneriyan pêk tîne, civak bixwe ye. Civak dewlemend û bilind dibe.

Ev şoreşa ku li quntarên rêzeçiyayên Toros û Zagrosan pêk tê, dibe ronahiya mirovahiyê. Hin afirîneriyên civaka xwezayî hene ku hêj jî mirovahî nikare dev ji wan berde û nikare jiyaneke bêyî van afirîneriyan saz bike. Him di qada ramanî de him di warê berheman de him jî di qada teknolojiyê de berhemên wiha yên dewlemend hene ku bûne malê hemû mirovahiyê. Heta mirov jê re tenê bêje Şoreşa Neolîtîkê, ev pênase kêm dimîne. Ew pêvajo, pêvajoyeke rêzeşoreşan bû. Di serdemeke ku ji deh hezar salan bêtir e berdewam kiriye de bi hezaran afirînerî, nûvedan û berhem derketine holê. Diyardeya herî girîng jî ew e ku hişmendiyeke ku bi sedhezaran salî berdewam kiriye, hatiye guhertin. Teşegirtineke nû ya hişmendiyêderketiye holê. Û pêvajoyeke werarî ya ku tê de pêngavên rêzeşoreşger hene hatiye jiyîn. Ev jî kiriye ku civakîbûn, bi hişmendiyeke nû pêk were. Divê em vê xalê jî diyar bikin: civakîbûn, hişmendiyê bi teşe dike û hişmendî jî mohra xwe li civakîbûnê dixe û reng, teşe, cewher û şêweyê wê ava dike. Diyalektîka têkiliyê ya di nava wan de li ser bingeheke simbiyotîk e. Jiyana civaka xwezayî nîvendên hişmendiyê diyar dikin û nîvendên hişmendiyê jî jiyana civaka xwezayî beralî dikin û wê bi teşe dikin. Sûde didin hev û ji hev sûdê werdigirin. Hişmendî rê nîşanî hemû rastî, başî û xweşikahiyan dide û ji ser bîrdoziyê û bi riya sinc, polîtîka û hunerê diyar dike û pêş dixîne. Di heman demê hişmendî, xwediyê hemû şaşitî, nebaşî û nexweşikbûnan e jî. Hişmendî, jiyana komunal a wekhev, hevgirtinê û jiyana kolektîf ava dike, wan diparêze û dike ku mirov xwedî li wan derkeve. Li ser bingeha dijberiya van nirxên dîrokî, tiştê ku jiyana takekes, ezez û xwedaniya taybet ava kiriye jî, hişmendî ye. Tiştê ku bihuşt û dojeha ku di mîtolojî û olan de behsa wan tên kirin afirandine jî hişmendî ye. Hêzên desthilatdar û mêtînger, li gorî hişmendiya xwe,ji xwe re bihuşt ava kiriye û di serî de ji bo jina dayîk, ji bo hemû pêkhateyên civaka jêrîn jî dojeh ava kiriye. Avaker û afirînerê hemû fenomenên erênî û neyînî yên heya roja me ya îro jî hişmendî ye. Hişmendiya ku li gorî pêdiviyên civakîbûnê pêş dikeve û vediguhere, di binê ronahiyê û xweşikbûnê de di riyeke erênî de diherike, lê hişmendiya ku bi berjewendiyên hêzên desthilatdar û mêtînger ên takekes, ezez û berjewendîparêz hatiye dorpêçkirin jî di çiravên nebaş û tarî de riya xwe didomîne. Wê çaxê tiştê ku destpêk û encamê diyar dike, hişmendî ye. Ji destpêkê heta roja dawî, tiştê ku mirov jî beralî dike, hişmendî ye. Hişmendiya ku di gavên pêşîn ên civakîbûnê de derket holê, şoreşa neolîtîkê pêk anî û gelek berhemên girîn ên jiyanî yên ku heta roja me ya îro hatine û nirxên madî

û manewî afirandin. Lê paşê dîsa hişmendiyê, Levîathanê ku nabîne, nabihîse, nahise û têr nabe jî afirand. Şêwaza pêşîn a vê hişmendiyê, di perestgehên wê demê Zîgûratan de pêk dihat. Şînbûna tovên hişmendiya zilam û geşbûna wê, di vê demê de pêk tê. Di encamê de cihê model ê dewletê û hêzên mêtînger ên ku afirîneriyên hişmendiya zilam in, ev Zîgûrat in. Xistina jinê, avakirina desthilatdarî û dewletê û kûrkirina mêtîngeriyê, di van perestgehan de pêk hatin. Lê mirov nikare paşguh bike ku plansaziyeke mezin a ji bo hilberînê jî pêk hatiye û birêxistin bûye; hilberîn zêde bûye; rahibên wê demê behremend bûn; nivîs, felsefe û hesab hatine dîtin; çawaniya hunerî pêş ketiye; vegotina wêjeyî ya mîtolojiyan pêş ketiye; avanîsazî pêş ketiye û behremendî û pisporî kirine ku berhemdarî zêde bibe û hwd. Lewra ***“Mirov nikare perestgehan, weke camî û kilîseyên roja me bibîne. Di serdemên xwe yên pêşîn de weke navendên hilberîna nû ya madî û hişmendiyê rista xwe leyîstine. (...) Perestgeh, ew sazî ne ku hişmendiyê ji xwe re dikin bingeh. Di zimanê Helenî de ji hişmendiya perestgehan re ‘teorî’ tê gotin. Teorî, di zimanê Helenî de tê wateya ‘nêrîna xwedayî’, ‘paradîgmaya sereke’”.*** (3) Paradîgmaya ku hişmendiyê ava kiriye, di avaniyên ku em îro ji wan re dibêjin Zîgûrat de û di heman demê de di wateya bîrdozî û çandî de jiyanî dibe. Ev peyva ku tê wateya “zikê çiya (şkefta diçiya de)”, him bandorê li hişmendiyê dike him jî bingeha wê nîşan dide. Tiştê ku behsa wê tê kirin jî wate û girîngiya Kurdistanê, nûvedanên dê û bavên Kurdan û taybetmendiyên wan ên afirîner û hilberîner e. Di şoreşa neolîtîkê de nirxên wiha pîroz derketin holê ku serdema xwe derbas kirin, hîn jî ji hêla civakan ve bi awayekî gelemperî têne bikaranîn û rasterast bi berdewamkirina jiyanê û hebûna mirovahiyê ve girêdayî ne. ***“Ji bo ku em hûnandinên hişmendiyê yên ku ketine nava hev çêtir fêm bikin, wê sûdwer be ku em rehên qalibên hişmendiyê, di destpêka dîrokê de, heta beriya wê di baweriya pir-xwedayîbûnê de, di cîhana mîtolojîk de û bi taybetî jî bi têkiliya bi mîtolojiya Sumerî de bigire dest.”*** (4) Ji bo dema me ya niha, divê hişmendiya vê demê rast were fêmkirin û nirxên pîroz ên vê demê were zanîn. Tiştên ku hatine jiyîn, mûcîzeya civaka dîrokî ye. Hêzên desthilatdar û sermayeyê yên ku piştî pêngava hişmendiya zilam û pêvajoya dij-şoreşê ava bûn, di destpêkê de dewletê û paşê jî şaristaniya fermî pêş xistin. Diyardeya dewletê ya ku li ser bingeha dijberiya civak, sinc, çand û aboriyê ava bûye, di destpêkê de dewleta koledar ava kir û paşê jî bi derbasbûna dewleta feodal re xwest ku hêlên

xwe yên riziyayî bi qalikeke şeklî veşêre. Dewlet bixwe, wextê ku şaristaniya fermî pêş dixîne, pêwîst e ku xwe bispêre çanda civakî. Her şarsitaniya dewletperest pêwîst e xwe li ser çandekê bidomîne. Lê pêdiviya öandên civakî bi şaristaniya fermî tune ye. Lê şaristaniyên dewletperest bêyî çandê nikarin hebûna xwe berdewam bikin. Şaristaniya fermî ya ku tê pêşxisitn, diyardeya çandê ya ku ji xwe re dike bingeh berovajî dike û wê dixe binê xizmeta xwe; berovajî dike û dibêje ku ew a wê ye. Desthiltdariya sermayedar jî herî zêde berovajî kiriye, vî karî kûr û berfireh kiriye û pêk aniye. Desthilatdariya sermayedar, hişmendiya xwe pîroz dibîne û ji pêvajoya dewletperest heta roja me ya îro ji civakîbûnê çi mabe, dike malê xwe. Dijberiya hişmendiya civakî jî di binê rûpoşên cuda de tê meşandin. Ji dêvla sincê, hiqûq tê bicihkirin. Her çiqasî di avabûna hiqûqê û qanûnan de keda civakî hebe jî di binê inîsiyatîfa xwe de û li gorî berjewendiyên xwe teşe dide wê û wê beralî dike. Xwe dispêre hiqûqê û her cûre bêdadiyê, neheqiyê, zordestiyê, zorbaziyê û faşîzmê pêş dixe. Û bi gotinên weke "em li gorî zagonan tevdigerin; hiqûqa me ya navxweyî vê yekê pêwîst dike; bila herkes li gorî zagonan tevbigere; bilindbûna makezagona me ji hertiştî nirxdartir e" civakê bêdeng dike. Hewl dide hêzên dijber bêdeng, bêbandor û bêçalakî bikeû nêzîkahiyên xwe yên dijmirovî rewa nîşan bide. Lê ji ber ku hemû karên xwe li gorî hişmendiya zilam û li dijî hişmendiya şoreşger pêş dixe, ne gengaz e ku bigihêje encamê. Heger hişmendiya şoreşger carekê alternatîfekê ava bike êdî ne gengaz e ku bigihêje encamekê. Hişmendiya şoreşger jî wê vegera li hişmendiyê û veguhertinê pêk bîne. *"Wê berdewam bike"...*

***Jêder:***

*1 Abdullah OCALAN: "Pirsgirêka Kurd û Çareseriya Neteweya Demokratîk" (cildê 5'emîn)*

*2 Abdullah OCALAN: "Parastina Gelekî"*

*3 Abdullah OCALAN: "Parastina Gelekî"*

*4 Abdullah OCALAN: "Parastina Gelekî*